Nêrînek azad

XÊZÊN SOR

Pîr RUSTEM

Miletê Kurd û bi xêra hinek rewşenbîrên xwe û nemaze ewên ku, piştî têkçûna şoreşên bakurî Kurdistanê daketibûn binxetê; "başûrî Kurdistanê" û karîbûn xwe bidana hev û hinek komeleyên xwe yên civakî û rewşenbîrî bidana damezrandin, çi li bajarên Kurdan bin; wek ên Cezîrê yan jî li Efrîn û Kobaniyê û çi jî li bajarên mîna Şam û Helebê.

Ev komele dê bibine bingeheke xurt ji damezrandin û avakirina partiyeke konevanî; Partiya Demokrata Kurdistan li Sûryê "Partî", ew li sala 1957 an tête damezrandin û ew silogana "rizgarkirin û yek-kirina Kurdistanê" hilde û heya bi demekê, li ser vê bernameyê, karên xwe bikin, ta ku ew dikeve ber ezmûna xwe ya herî pêşîn di sala 1960 î de û heyştê heval tête girtin.

Ev ezmûna pêşîn dê bihêle ku, ew cudatiyên hîne di rojên pêşîn de, di navbera du rewtekan de hebûn, evê carê bi xurtî derkevin pêş hevalan û bihêlin perçebûneke kûr têkeve navbera ewana. Rewtekek di bin serokatiya Osman SEBRÎ de û dixwezin li ser nav û bernameya "Partî" bimînin û rewteka din jî di bin serokatiya Dr. Nûrdîn ZAZA û li gor heyama û hokerên zîndanê, dixwazin hinek guhertin têxin nav û bernameya "Partî".

Lê, ji bilî evan herdu rewtekan û hîne di demên pêşîn de, hinek heval li dijî bernameya "Partî" rawestiyabûn û wan gotibû: Ev nav û silogan û bernameya ku, em hildidin ji hêz û

şênên me mezintir e. Û wilo ev hokera nuh dê ji wan re bibe derfet ku, ew evê carê bi xurtî dengê xwe bilind bikin û daxwaza vegera ji ewa "bernameya bilind" bikin û hinekî "riyalîst" biramin.

Em dikarin bibêjin ku, ev kêlîk, bû mofirka di navbera du qonaxan de; Qonaxa ji berî xêzên sor û bizav û ezmûna bi hêza ewlekarî ya dewleta yekbûyî di navbera Sûryê û Misirê de û qonaxa piştî girtina ewan hevalên "Partî" ku, ew ezmûnek bû ji wan re û hêşt bêtirî rewtekekê di nav "Partî" de derkeve.

Lê, ev xêzên sor dê di aste û ezmanekî de rawestin; ango ew asûman dê her û her nizimtir bibe, her ku, dewleta Sûryê xûrt bibe û hêzeke weke ya Beis destlatiyê bi dest xwe ve bîne û Sûryê tenê Ereb, weke dewlet û milet bibîne û li aliyê din jî "Partî" her û her ji hev bête cudakirin û lawizkirin.

Mixabin û weke ku, em di roja îro de, li nav û bernameyên partiyên xwe dinirin, em li ewê rastiyê rast tên ku, asûmanê wan her çûye nizimtir bûye. Lê, hîne ji berî ewê yekê jî pirseke dîtir xwe dide pêş; gelo çima ew cudatî kûr bû û gihêşt ku, "Partî" perçe bibe û ne tenê carekê, lê bighe ku di roja îro de, yek nikaribe navên partiyên xwe lezber bike, hin ji ber pirbûna wan û hin jî ji ber ku, navê her du-sê partiyên ji hev cuda bûne wek heve

D.R.(7)